

KT
Zanîngeha Mardîn Artukluyê
Enstîtuya Zimanên Zindî yê Li Tirkîyeyê
Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî
Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez

BIKARANÎNA ZIMAN DI NÛÇEVANIYA KURDÎ DE

Maşallah Dekak
13721055

Şêwirmend
Doç. Dr. Abdurrahman Adak

Mêrdîn 2018

Kurte

Armanca vê xebatê tespîtkirina bikaranîna zimanê xelet di hêla rastnivîs û şeweyê ya nivîsîna nûçeyên kurdî deye. Beriya vê xebatê em gelek caran di nûçeyên kurdî de rastê mantiqa tirkî hatine ku bi hevokên kurdî hatine nivîsîn û bi temamî ji rih û giyanê zimanê kurdî dûr in. Di vê xebatê de me rê nîşan daye ka dê zimanê kurdî bi awayeke rast û resen çawa di nûçevaniyê de bê bikaranîn. Ev yek hem di hêla rastnivîsê de û hem jî di hêla şewaza nivîsîna nûçeyan de bi mînakên yek bi yek hatine vegotin. Ji ber ku qada nûçevaniya kurdî bi taybetî jî kurmancî di hêla nûçevaniyê de xwedî berhemên zêde nîn in, me nekarî em ji çavkaniyan zêde sîd werbigrin. Lê dîsa jî me hewl da bi gotar û nûçeyên ku di malperên kurdî de hatine weşandin, bikaranîna zimanê kurdî di hêla rastnivîs û şewazên nûçeyan de nîşan bidin. Di vê xebatê de me nûçevaniyê di bin du beşan de "Bikaranîna ziman ji aliyê şewazê ve" û "Bikaranîna ziman ji aliyê rastnivîsê ve" dabeş kir. Ji bo têgihiştineke baş di herdu beşan de jî mînakên cur bi cur hatin bikaranîn.

Kurtebêje: Nûçevanî, bikaranîna ziman, şewaz, rastnivîs, mantiqa wergerê, lêkerên nûçeyê

Özet

Bu çalışmanın amacı Kürtçenin Kurmanci lehçesinde yapılan Kürtçe haberciliğinde haber yazımı ve haber tarzını mercek altına almaktır. Bu çalışmadan önce Kürtçe haberciliğinde yapılan çevirilerin Türkçe mantığıyla ile yapıldığını hatırlatmak gerekir. Kelimeler her ne kadar Kürtçe olsa da, kurulan cümlelerin, kullanılan atasöz ve deyimlerin, cümlelerin dizilişinin Türkçe mantıkla yapıldığına tanık oluyoruz. Bu çalışmada Kürtçe haberciliğinde yazım ve üslubun nasıl olması gerektiğini bazı örnekleri ile gözler önüne seriyoruz. Yapılan tüm tespit ve analizlerin daha iyi anlaşılabilmesi için bu çalışmada daha çok örneklemeler esas alındı. Ne yazık ki Kürtçe haber dili üzerine yapılan araştırmalar ve yazılan kitaplar kıt olduğundan, olabildiğince Kürtçenin Kurmanci lehçesinde yayın yapan internet sitelerinde yer alan haber ve makalelerden faydalanma yoluna gittik. Elinizde bulunan çalışmamızda Kürtçe haberciliği yazım ve üslup olmak üzere iki bölümde topladık. Konunun daha iyi anlaşılabilmesi için de her iki bölümden bol örnekler verme yolunu seçtik.

Anahtar sözcükler: Kürtçe Habercilik, dilin kullanımı, üslup, yazım dili, çeviri mantığı, haber fiilleri

Pêşgotin

Îro medya û çapemeniya kurdî çî bi şêwezarê kurmancî, çî jî bi şêwezarê soranî û zazakî rojane weşanên xwe didomînin. Ew her roj êdî yek ji endamê malbata me ne ku em gelek caran ji dê û bavên xwe, xwîşk û birayên xwe, ji zarokên xwe zêdetir pê re wext derbas dikin. Ligel wê bi riya teknolojiyê êdî cîhana ragihandinê ya înternetê bi riya telefonên baqil di bêrkên me de ne. Ger em medyaya civakî ya kurdî-nûsan jî bihesibînin, girseyeke bikarhînerên kurdiya nivîskî derdikeve pêşiya me. Di rewşekewisa de ku li welatê me xwendina bi zimanê kurdî di dibistanan de tune ye, danûstandinên me yê fikrî û hestiyarî zêdetir bi riya van amûrên ragihandinê çêdibin. Ji ber vê yekê jî her xeletiyê ku di van dezgehên de tê kirin, yekser di nava civaka kurdî-nûs de bandora xwe dike. Di dema amadekirina projeyê de min di hêla çavkaniyan de zehmetiyên gelek mezin kişand. Mixabin heta roja me ya îro jî li welatê me hejmara pirtûkên ku li ser rojnamevaniya kurdî hatine nivîsîn tenê çar in û ji van çavkaniyan du heb qet li ser vê mijara ku li ser dixebitim tiştek nenivîsîne. Ji ber vê yekê jî neçar mam ku qîma xwe bi gotar û nûçeyên malperên kurdî bînim û azmûna xwe ya 19 salan jî min li ser van çavkaniyan zêde kir. Di dema amadekirina projeya min de ji ber alîkariya wî ji şêwirmendê projeyê Rêzdar Doç. Dr. Abdurrahman Adak re gelek spas dikim. Divê bi bîr bixim ku mamoste Doç. Dr. Hayrullah Acar jî di dema amadekirina projeyê de ji min re bû rênîşanderekî gelek baş. Ji ber ked û eleqeya wî destxweşî li mamoste Acar dikim. Her wiha ji bo dostê xwe yê hêja Mikail Bilbil re jî gelek spas dikim. Lewre di hêla amadekirina projeyê de, di warê teknîkî de gelek alîkariya min kir. Bi hêviya ku rojnamevanên nû qîma xwe bi van projeyan neynin û li ser hîmekî zanistî û profesyonel kurdiya ragihandinê bi pêş bixin û berhemên gelek giranbuha binivîsin.

Maşallah Dekak

Destpêk

Yekemîn rojnameya Kurdî di 22'ê Nîsana sala 1898'an de, li Qahîreya Misrê, ji aliyê Mîqdat Mîdhed Bedirxan ve hat derxistin. Navê vê rojnameyê “Kurdistan” bû. Ji ber vê yekê jî 22'ê Nîsanê wekî Roja Rojnamevanên Kurd tê pîrozkirin. Ev dîrok li Herêma Federal a Kurdistanê bi awayekî fermî tê pejirandin. Ji ber ku ev rojname li sirgûnê derketiye, rojnamevaniya Kurdî wekî “Rojnamevaniya Sirgûnê” jî tê binavkirin. Rojnameya Kurdistan piştî Qahîreyê li Swîsreyê û Londonê jî hatiye çapkirin. Destpêka rojnamevaniya Kurdî li gorî welatên Rojhilata Navîn dereng nîn e. Lê ji ber şert û mercên siyasî û dabeşkirina sînorên welatê me bi awayekî fizîkî, polîtîk, aborî û desthilatdarî, wekî edebiyat, huner, reform û ronensansê rojnamevaniya Kurdî jî nekariye bi qasî tê xwestin bi pêş bikeve. Ji ber nebûna statûyeke siyasî ya kurdan, rojnamevaniya Kurdî tenê di warê polîtîk de bi pêş ketiye. Beşên rojnamevaniyê yên mîna çand û huner, edebiyat, spor, magazîn, civak û jiyana aborî û aktueliyê de zêde bi pêş neketiye. Ji ber van pirsgerêkan şewaza nivîsîna nûçeyên kurdî li gorî welatên pêşketî yên cîhanê gelek qels maye. Her wiha ev hemû pirsgerêk bûne sedema ku di rastnivîsa nûçevaniya kurdî (kurmancî) mantiqa wergera tirkî serdest be û zimanê kurdî derbeyeke mezin bixwe. Ji ber nebûna dibistanên kurdî zimanê rastnivîsê ya ragihandina kurdî jî gelek qels maye. Di rastnivîsa nûçeyan de tevlihevî û aloziyeke mezin çêbûye.

Li Bakur rojnamevaniya kurdî

Rojnamevaniya li welatê me bi awayekî profesyonelî ji ber rewşa awarte û qanûnî, bi salan li sirgûnê berdewam kir. Di serî de rojnameya Azadiya Welat, Dema Nû û Ajansa Nûçeyan a Dîcleyê (DÎHA), Kovarên Rewşen, Zend û Nûbiharê jî li sirgûnê, li Stenbolê dest bi weşana xwe kirin. Ji ber vê yekê jî rojnamevaniya kurdî ne li ser koka xwe, zêdetir bi tama

sirgûnê bi pêş de çû. Rojnamevaniya kurdî yan bû belavoka partiyeke siyasî yan jî bû kovareke edebî û kulturî ya kurdan.

Piştî ku di warê siyasî û polîtîk de di qanûnan de hin guherîn çêbûn û rewşa awarte rabû, weşangerên Kurd berê xwe dan welat û Amed ji xwe re wekî navend girtin. Azadiya Welat di sala 2004'an de navenda xwe ji Stenbolê anî Amedê û piştê di 15'ê Tebaxa 2006'an de dest bi weşana xwe ya rojane kir. Piştî Azadiya Welat, Rojnameya Dema Nû ya heftane (rojnameya bi Kurdî-Tirkî) û Ajansa Nûçeyan a Dîcleyê jî navenda xwe anî Amedê. Lê digel vê yekê jî her çiqas hin pêşketinên baş di ragihandinê de pêk hatibin jî anîna van dezgehên ragihandinê bo bajarê Amedê jî nekariye pêşî li aloziya rastnivîsê bigre û di şêwaza nivîsîna nûçeyan de kurdî bigihije asta ragihandina cîhanê. Li hemû welatên cîhanê rojnamevan Beşa Ragihandinê ya Zanîngehan dixwînin û piştê di saziyeke weşanê de dest bi kar dikin. Lê li welatê me heta zimanê Kurdî nebe zimanê perwerdehiyê, di zanîngehan de beşên ragihandin û rojnamevaniyê bi zimanê kurdî perwerde nedin dê rojnamevaniya Kurdî negihije asta profesyoneliya rojnamevaniya cîhanê. Em ê di vê projeyê de hewl bidin ku di hêla rastnivîsa nûçeyên kurdî û bikaranîna şêwaza nûçeyê de hin pirsgerêkên sereke tespît bikin û riya sererastkirina van xeletiyên nîşan bidin

BEŞA YEKEM

BIKARANÎNA ZIMAN JI ALIYÊ ŞÊWAZÊ VE

1. 1.Nûçe û şêwaz

Peyva "Nûçe" zêdetir li welatê me ji aliyê rojnamevanên kurmanc ve tê bikaranîn. Di demên dawî de di nava rojnamegerên kurmanc ên Herêma Kurdistanê de jî ciyê xwe girt. Di soranî de "Dengûbas" tê bikaranîn. Ev peyv di erebî de "El Exbar" û di Îngilîzî de weke "News" tê bikaranîn. Tirkên jî exbar ji Erebi girtiye û wekî "Haber" bi kar anîne. Di kurmancî de jî peyva "Nûçe" ji "nû çi heye" pêk tê. Di çêkirina vê peyvê de jî dixuye ku hemû bûyerên ku nû qewimîne û nû hatine bihîstin mijara nûçeyê ne. Nûçe mirov agahdar dike, perwerde dike, dikenîne, xemgîn dike û kêfxweş dike. Di destpêka ravekirina nûçeyê de, nûçe wiha hatine ravekirin:

- Her bûyer nûçe ye.
- Hemû tiştên ku xwendekar dixwazin bixwînin nûçe ne.
- Her tiştê ku dê bala mirovan bikişîne û eleqe bibîne nûçe ye.
- Dîroka duh e.
- Rapora bûyerekê ye.
- Hemû bûyer û qewimîn in.
- Kakila hemû rastiyan e.
- Çîroka çîrokê ye.

Bi gotineke klasîk **"heke kuçik mirov gez bike ne nûçe ye lê heke mirov kuçikî gez**

bike nûçe ye." Ev ravekirin di sala 1980'yî de ji aliyê rojnameger **John Bogart** ve hatiye kirin. Ev ravekirina nûçeyê ya Borgat wekî nirxê nûçeyê tê pejirandin.

Li her derê cîhanê, li her derê ku mirov lê dimînin bûyerên ku dibin mijara nûçeyê diqewimin. Mirin, welidîn, afat, pevçûn, serkeftin, têkçûn, pêşveçûn, hevşabûn û hemû bûyerên ku bala mirov dikişîne, li ser mirovan bandor dike mijara nûçeyê ne. Nûçe ji bûyeran pêk tê. Bûyer dibe ku qewimînek be û dibe ku gotinek be. A girîng nirxê wê yê nûçeyê ye. Armanca hemû nûçeyan agahdarkirina civakê ye. Gelek pispor û rojnamevan nûçeyê wiha rave dikin: "*Nûçeagahiya herî nû, herî dawîn û herî balkêş a der barê qewimîn, kes, tişt û bûyerên ku li cîhanê diqewimin de ye.*"

1.2. Hêmanên nûçeyê û şêwaz

Pênc hêmanên bingehîn ên nûçeyê hene. Mirov bêyî van hêmanan nikare nûçeyek binivisîne. Hêmanên bingehîn ên nûçeyê mirov dikare weke *rastî/rasteqînî, nûbûn/rojevîbûn, balkêşî, girîngî û fêmarîbi* nav bike.

1.2.1 Nirxên nûçeyê

Di rojnamevaniya hemû cîhanê de hin nirxên sereke yê nûçeyê hene ku bê îstîsna rojnamevanên hemû welatan di nûçeyên xwe de van nirxan bi kar tînin. Hêmana *demê, ûrbûn/nêzîkbûn, balkêşî, bûyerên ku kêmtêne dîtî* û *girîngî*, nirxên nûçeyê ne. Bêyî van şeş nirxan ne pêkan e nûçeyek derkeve holê. Xalên sereke "*balkêşî*" û "*girîngî*" hem nirx û hem jî hêmanên hevpar ên nûçeyê ne.

1.3.1. Şêwaz û pîvanên nivîsîna nûçeyên kurdî

Bê guman di hemû zimanan de pîvanên nûçevaniya profesyonel yek in. Lê ji ber ku li welatê me perwerdehiya bi kurdî tune ye, di hin pîvanan de nûçevaniya kurdî divê zêdetir

girîngî bide van pîvanan. Bi taybetî jî di hêla zimanê hunandina nûçeyê de ev pîvan ji bo kurdî gelek girîng e.

1.3.2.Nûçeyên kurdî divê bi kîjan pîvanan bîn nivîsîn?

- Divê nûçe her wekî ku ji devê kesekî tê dayîn bê nivîsîn

- Divê nûçe rast û kurt be. Bi gotineke din kurt û kurmancî be. Hemû tebeqeyên civakê ast çî dibe bila bibe divê ji vê nûçeyê heman tiştî fêm bikin.

- Di hevokê de divê ramanek tenê çî bigre û ger ramanên din hebin jî divê di hevokên pey de bîn bicihkirin.

- Ziman divê sade be û ji "zimanê akademîk" ango zimanê rijî ya çêker dûr be. Pêwîst e di nûçeyê de peyvên ku tên zanîn bîn bikaranîn.

- Ji berasîmîlasyon û helandinê pêwîst e heta ji destê mirov tê peyvên biyanî ku nayên zanîn neyên bikaranîn. Ger bîn bikaranîn jî divê ev peyvên biyanî di nava kevanê de bîn nivîsîn. Divê xwendevan neçar nemînin ku ji bo hevokên biyanî li ferhengê binêrin.

- Divê di nûçeyê de hevokên zêde û dubare nebin û kakila mijarê bi kurtî ûsade bê vegotin.

1. 4. Şêwaz û girîngiya ziman di nûçeyên kurdî de

Zimanê nivîsîna nûçeyên nivîskî, bihistîner û dîtbarî çiqas sivik û zelal be, dê ewqas bi zelalî ji aliyê xelkê ve bê fêmkirin. Ji ber vê yekê jî divê zimanê ku di nûçeyê de tê bikaranîn pir hêsan be û herkes bikaribe jê fêm bike. Lewre di nûçeyê de tiştê girîng ew nîne katu çî dibêjî ya girîng e ka xwîner, temaşevan û guhdar ji gotina te çî fehm dikin. Ji ber vê yekê jî divê nûçe bi zimanekî wisa bê nivîsîn ku ji kesên dibistana seretayî qedandine heta kesên

zanîngeh kuta kirine, herkes heman tiştî jê fêm bike. Di nûçeyê de divê mirov xwe ji peyvên ku pir zehmet tên bilêvkirin dûr bixe. Her wiha di şûna zimanekî teknîk û peyvên biyanî de divê peyvên ku di nava civakê de zêde tên bikaranîn bîn tercîhkirin. Di nûçeyên kurdî de pêwîst e zimanekî rast bê bikaranîn û peyvên xelet neyên bikaranîn. Lewre kesên ku nû dest bi xwendina kurdî kirine pêşî çî xwendibin, dê wê xeletiyê weke "rastî" bipejirînin û ev yek wisa bike ku zimanê kurdî di nava nifşên nû de xelet bê bikaranîn. Divê em ji bîr nekin ku di kurdî de zimanê nûçeyê bi qasî hêmanên nûçeyê girîng e.

1.5.1.Şêwaza bikaranîna gotinên pêşiyên û biwêjan

Di nûçevaniya kurdî de gotinên pêşiyên û biwêj ger di cihê xwe de û lêhatî bîn bikaranîn dê nûçeyê xweştir bikin û rêbidinku baştir bîn fêmkirin. Ji ber vê yekê jî heta ji destê rojnamevanan bê, bikaranîna gotinên pêşiyên û biwêjan dê nûçeyê dewlemendtir bike. Her wiha bi bandora van gotinên pêşiyên û biwêjan dê zimanekî zelal, sade û fesîh ku herkes jê fêm dike derxe holê û van gotinan jî di nava civakê de zêdetir belav bike. Ji bo nûçeyê baş, pêwîst e rojnamevanên kurd gencîneya kurdî ya folklorîk jî baş zanibin. Heke na dê xetereya wergera gotinên pêşiyên û biwêjan a ji tirkî derkeve holê û ev yek dê hem zimanê kurdî bişikîne û hem tama kurdî ji holê rake. Ji ber vê yekê jî dema gotineke pêşiyên an jî biwêjek hate bikaranîn divê ew gotin û biwêj ji sedî sed kurdî bin. Pêwîst e em hay jê hebin û bizanibin kîjan gotin û biwêj bi tirkî ne û kîjan bi kurdî ne. Bo nimûne di nûçeyek de biwêja "Dagdan gelen bağdakini kovdu" bi wergera "Ji çiyê hat berda yê malê" neyê bikaranîn. Di şûna wergera motemot de gotina pêşiyên a kurdî "Hat ji newalê berda yê malê" bê bikaranîn.

1.5.2.Şêwaza wergerê di nûçeyan de

Nivîskar Bahoz Baran jî di gotareke xwe ya malpereke kurdî de bal dikişîne ser têkiliya di navbera zimanan de ka weke mirovan çawa tesîrê li hev dikan. Baran, wiha dibêje:

Ziman jî wek însanan, bi hev ra didin û distînin û tesîrê li hevdu dikan. Ev danûstendin tiştekî pirr normal e. Mirov dikare vê danûstandin û tesîrê, heta radeyekê wek tiştekî normal qebûl bike, ev yek zirarê nede bingeh,

pergal û bastûra zimên. Zimanên ku binemala wan yek e, ji aliyê bastûr û pergala xwe va dikarin li hevdu bikin, bêje û gotinên wan ên ku tên veguhastin dibe ku li hev bifesilin. Lê eger ziman, ji aliyê binemalê va ji hev dûr bin, ew danûstandin pirr zêde çênabe û tiştên ku tên veguhastin zêde li hev nayên. Kurmancî, zaravayê herî berbelav ê Kurdî ye û ji binemala zimanê Hînd-Ewropî ye; lê Tirkî ji binemala Ûral-Altayê ye û ji gellek alîyan va ew û Kurdî ji hev cihê ne û pirrî caran gotin û hevokazîya wan li hev nake. Zimanên serdestan, ji ber derfetên desthilatdarîyê, pirrî caran bêhnê li zimanên bindestan diçikînin.

Kesên ku nivîsan werdigerînin, ji ber ku bi zimanê xwe perwerde nebûne û tesîra Tirkî li ser wan heye, wergera wan gellek caran beravêtî ye. Di vî warî da, zimanê herî derbxwarî zimanê çapemenî, sazî û dezgehan e. Mirov piçekî bala xwe bide nivîsên wan, dê fam bike bê çawa nivîsên xwe li gorî Tirkî werdigerînin û çî bobelatê tînin serê zimanê xwe. Xwendin, axaftin û nivîsîna bi Tirkî, tesîrê li mantiqa Kurdî dike, Kurdên ku bi Tirkî perwerde bûne bivê nevē derbxwarî ne, lê wextê mirov ji gotina xwe bimîne û bi zimanê xwe nenivîse, nexwîne û neaxive û korkorane xwe li wergerê biqelibîne ev tesîrê dê zêde bibe.¹

Piştî van gotinan Bahoz Baran bi dehan mînakên xelet ên wergera ji tirkî ku di çapemeniya kurdî de derketine dane. Ji ber ku lînkê wan rojnameyan di nivîsa Baran de tune ye û tu çavkanî jî nehatiye nîşandan, min ji mînakên wî yê wê gotarê feyz girt û li zimanê rojnamevaniya kurdî anî. -Cemeda di navbera herdu welatan de heliya

Ev hevok rasterasat tirkîya "İki ülke arasındaki buzla eridi" ye û motemot bi mantiqeke xelet hatiye wergerkirin.

Rastiya vê wergerê ev e: Herdu welat li hev hatin / Herdu welatan li hev kir

- Noşîrvan Mistefa bo bêdawîbûnê hate oxirkirin

Ev hevok rasterast wergera tirkî "Noşîrvan Mustafa sonsuzluğa uğurlandı" ye.

Rastiya vê wergerê divê wiha bûya:

Cenazeyê Noşîrvan Mistefa hate veşartin / Cenazeyê Noşîrvan Mistefa spartin axê

¹Bahoz Baran (28.04.2016-Malpera Amîdakurd) Lînk:

http://www.amidakurd.net/ku/tekst/kurmanc%C3%AE_%C3%BB_mantiqa_tirk%C3%AE

- Bivir li pêvajoya aştiyê xistin

Ev biwêj wergera "Barîş sûreci baltalandî" ye û rasterast ji tirkî hatiye wergirtin.

Rastiya vê wergerê divê wiha bûya:

Peşke li aştiyê xistin / Rê li ber aştiyê girtin / Derbe li pêvajoya aştiyê xistin.

- Mam Celal jiyana xwe wenda kir

Ev hevok "Mam Celal hayatını kaybetti"ya tirkî ye û bi mantiqeke xelet hatiye wergerkirin.

Rastiya vê wergerê divê wiha bûya:

Mam Celal jiyana xwe ji dest da / Mam Celal koça dawî kir / Mam Celal wefat kir / Mam Celal rehmet kir

- Girtiyên siyasî di sînore mirinê de ne

Ev hevok wergera tirkî "Siyasî tutuklular ölüm sınırında" ye.

Rastiya vê wergerê divê wiha bûya:

Girtiyên siyasî li ber mirinê ne

1.5.4. Bandora wergera tirkî li ser zimanê axaftin û nivîsînê

Ji salên 90'î û vir de her çiqas zimanê kurdî roj bi roj di nava civakê de kêr dibe jî hejmara kesên bi kurdî dinivîsin zêde dibe. Kurdînûs ji bo belavkirina bîr û ramanên xwe hewl didin di bendera înternetê de ji xwe re cihekî peyda bikin. Bi vê hewldanê re mirov dikare êdî qala bi sedan malperên kurdî bike ku bi şêwezarê kurmancî weşanê dikin. Lê ji ber tunebûna derfetên madî, gelek malper ji aliyê yek an jî du kesan ve tên birêvebirin. Dema rewş wiha be, xwediyên malperan ji bo ku malpera xwe tije nûçe, nivîs û gotaran bikin, gelek caran nivîs û gotarên li ber destê xwe bêyî ku radaksiyoneke baş bikin li ser malperê belav dikin. Ev yek jî hem di hêla rêziman de û hem jî di hêla serdestiya mantiqa tirkî de derbeyeke mezin li zimanê

kurdî ya nivîskî dixê. Gelek çaran em di malperan de rastê nivîs û gotarên wisa tên ku zimanê nivîsîn û axaftinê ya kurdî ji hev gelek dûr dixê. Ev yek jî rê li ber standardbûna kurdî ya reseniyê digre û zimanekî çêkirî ku ji axaftina civakê dûr e bi xwe re tîne. Nivîskarê Ferhenga Kurmancî û Tirkî, Tirkî-Kurmancî Zana Farqînî, di gotareke xwe ya diyarname.com de bal dikişîne ser xeteriya mantiqa tirkî ku zimanê nivîskî û axaftina kurdî ji hev dûr dike.

Zana Farqînî di gotara xwe de wiha dibêje²:

Em kurdên ku ji dibistanên tirkî rabûne, di bin bandora zimanê tirkî de ne. Wisan li me hatiye ku em bêyî hemde xwe bi tirkî difikirin û bi kurdî dinivîsin. Em hin qalib, terkîb, biwêj û riyên vegotinê yên zimanê tirkî li kurdî werdigerînin û di kurdî de bi kar tînin. Êdî hinek ji wan wekî bûbin helal malê zimanê kurdî, di zimanê me ye nivîskî de ji xwe re cih çêkirine. Tabî li vir mebesta min ne lidijderketina bikaranîna peyv û bêjeyên zimanê biyanî ye. Bi ya min, jixwe tu kes nikare biangêje (îdia bike) ku zimanê wî xwerû û sade ye. Îcar ku ev ziman bûbe zimanê nivîskî, bûbe zimanê perwerdehî û hîndekariyê. Ez bi xwe dijberiya wan kesan nakim ku çima di kurdî de peyvên biyanî bi kar tînin. Ji bo min a girîng ew e ku tehde li zimanê xwe nekin, bastûra (binyata) zimanê xwe têk nebin û ji pergala riya pêkhatina zimên dûr nekevin. Her wiha li peyvên zimanê xwe miqate bin, heta ji wan bê pûte û bayexê bi peyvên xwe bidin. Peyvên ku ji zimanên din ketine kurdî û dê bikevinê, divê mirov bi çavekî ilmî li wan binêre û bi helwesteke rast nêzikahî di wan bide. Jixwe yên ku bi qonaxa demên dûr û dirêj ketine zimanê me, şibiyane peyvên kurdî û bûne helal malê me. Zimanê kurdî êdî ew ji xwe re xwemalî kirine.

Nivîskarê Ferhenga Biwêjan Dîlawer Zeraq ku yek ji berhema herî navdar a nivîskarê tirk Oguz Atay "Tutunamayanlar" wergerê kurdî kiriye, di hevpeyvîneke xwe ya Yenî Ozgur Polîtîkayê de bal dikişîne ser mantiqa wergera tirkî ku bi riya çapemeniya kurdî tê kirin. Zeraq dibêje "Mixabin di şûna ku em wergerînin em werdigerin".

Îcar, kurd, ne xwedî dibistanan in, kêma kes hene ku wêjeyê dixwînin û para herî zêde kurdan bêtir çapemeniyê dişopînin, agahiyên der heqê qewaman û der heqê xwe de ji wir digirin. Û çapemenî, digel wêje û dibistanan, hêza sêyemîn a xurt e di parastin, rastbikaranîn û hînkirina zimanekî de. Loma jî sedema rexneya min a li ser hin

²Zana Farqînî Lînk: (<http://diyarname.com/news.php?Idx=157>) 07.03.2008

nûçeyan ew bû ku; car caran, nûçe û şîrove rasterast ji wergera zimanê tirkî û bi qalib û mantiqa tirkî dihat kirin. Ev yek dibû sedem ku kurdî biêşe. Belê, wekî dildarekî kurdî, rihê kurdiya min diêşiya... Heke wekî mînak bêjim; di nûçe an jî şîroveya xwe de, komegotineke bi vî rengî bi lêv dibû: “mijara gotinê.” Ev komegotin rasterast ji “soz konusu”ya Tirkî dihat wergirtin. Lê belê di nava gel de, komegotinên wekî “ketin behsê-hatin behsê-behsê gotinê-behsê xeberê” hene û zindî tîn bikaranîn. Rexneyên min kirî bi temamî li ser van awa û rengan bû; û armanc li ser tem û niyeta erênî û çêkirinê danandî bû.³

1.6 . Bikaranîna deman di hêla şêwazê de

1.6.1. Dema borî ya têdeyî

Di nûçeyê de, divê di şûna dema boriya dûdar de, dema boriya têdeyî bê bikaranîn. Mînak, divê di şûna gotina “Serokomar îro **hatiye** bajarê me” de, gotina “Serokomar îro **hat** bajarê me” bê bikaranîn.

Raweya dema borî bi xwe dema boriya têdeyî nîşan dide. Wekî nimûne, dema ku ji lêkera “çûn” paşgira raderî / -n / bê avêtin, li holê “çû” dimîne. Ew jî dema boriya têdeyî li gorî kesê yekjimar ê sêyemîn nîşan dide. Ji ber ku di demên borî de lêkerên gerguhêz cînavkên pêvebestî yên bireserê digrin ango li gorî bireserê (obje) têne kişandin. Di demên borî de rewşa lêkerên gerguhêz û negerguhêz ji hev cuda ye.⁴

Ji dema boriya têdeyî mînakên rast:

- Di navbera Mêrdîn û Şirnexê de otomobîlek û kamyonek li hev **qelibîn**.

³Yenî Ozgur Politika 30.04.2017 - HEVPEYVÎN - DILAWER ZERAQ -

lînk: <http://diyarname.com/hilbijartina-gisti-2015/news.php?Idx=25565>

⁴Samî Tan, Rêziman û Rastnivîsa Zaravayê Kurmancî, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol: 2005, r 241.

- Li Zanîngeha Artukluyê beşa kurdolojiyê **vebû**.

-Serokwezîr Nêçîrvan Barzanî serdana Tirkîyeyê **kir**

- Pêkhateyan li Kerkûkê merasimeke hevpar li dar **xist**

- Li Şîrnexê kana madenê hilweşiya: Birîndar hene

Ji dema boriya têdeyî mînakên xelet:

- Di navbera Mêrdîn û Şîrnexê de otomobîlek û kamyonek li hev qelibîne

- Li Zanîngeha Artukluyê beşa kurdolojiyê vebûye

- Serokwezîr Nêçîrvan Barzanî serdana Tirkîyeyê kiriye

- Pêkhateyan li Kerkûkê merasimeke hevpar li dar xistiye

1.6.3. Bikaranîna dema niha

Ji bo bûyer û qewimînên ku didomin divê dema niha bê bikaranîn.

Mînak:

- Lêpîrsîna der barê bûyerê de berdewam dike.

- Li Amedê xebatên hîlbijartinê didome

- Dadgehkirina rojnamevanan li Dadgeha Wanê berdewam dike

- Meşa kurdan a ber bi Enqereyê ve didome

- Festîvala çand û hunerê li Batmanê berdewam dike

Nîşe: Ev mînakên bikaranîna dema niha ya di nûçeyê de ji bo ajans, kanalên televîzyonan, radyo û malperên nûçeyan in. Divê ji bo rojnameyê dema niha neyê bikaranîn. Lewre nûçeyên rojnameyan ku îro qewimîne, sibê di çapê de digihijin ber destê xwîneran.

1.6.4. Bikaranîna dema bê

Ji bo bûyerên ku dê di nava demê de biqewimin û dema pêkhatina wan diyar e, **dema bê** tê bikaranîn.

Mînak:

- Zanîngeha Artukluyê **dê** sibê konferansa kurdolojiyê li dar bixe

- Xwendekar **dê** sibê dest bi dibistanê bikin

- Jinên Amedî ji bo pîrozbahiyên 8'ê adarê sibê **dê** biherikin Qada Stasyonê

1.6.5. Dema boriya dûdar

Di nûçeyên kurdî de dema borî ya dûdar nayê bikaranîn. Di nûçeyan de bikaranîna vê demê

xelet e. Lewre dema borî nûçeyê kevin dike û qîmeta vê agahiyê dadixe.

Mînak:

- Di azmûna zanîngehê de xortekî amedî bûye yekemîn

- Li Kirmanşahê erdhejek çêbûye

- Erdogan serdana Rûsyayê kiriye

Hişyarî: Di nûçeyê de dema boriya dûdar kêman caran (îstîsna) tê bikaranîn. Ev dem zêdetir jî di backgrounda (bekgrout) nûçeyê de tê bikaranîn.

1. 7. Ji aliyê şêwazê ve bikaranîna lêkerên nûçeyan

Di zimanê nûçeyê yê kurmancî de jî wekî her zimanên din hin lêkerên sereke tene bikaranîn. Ji ber ku di nava Kurdan de rojnamevaniya Kurdî zêde bi pêş neketiye mixabin tenê çend lêkerên jiberkirî tene bikaranîn. Ev yek hem di nûçeyê de dibe sedema dubarekirinê û hem jî zimanê nûçegihaniya Kurdî teng dike. Ev jî li ber pêşketina zimanê nûçeyê dibe astengiya herî berbiçav. Di Kurdî de jî wekî zimanên din gelek lêker hene. Lê ji ber ku ev lêker nehatine nivîsîn û berhemên der barê vê mijarê de kêman in, ev aliyê rojnamevaniya Kurdî qels maye. Ji ber ku li bakurê welêt Kurdî di dibistan û zanîngehan de qedexeyê, Kurdan nekarîne rojnamevaniyê di dezgehên akademîk û zanyarî de hîn bibin. Ji ber perwerdehiya bi Kurdî tune ye, rojnamevanên Kurd jî zêdetir bi hewldanên xwe hin pîvanên sereke yê rojnamevaniyê hîn bûne. Ev yek jî bûye sedem ku rojnamevaniya Kurdî bi awayekî akademîk bi pêş nekeve.

1.7.1.1 Lêkerên aktîf

... got

... wiha got

... ev tişt gotin

... axivî

... wiha axivî

... anî ziman

... vegot

... daxuyand

... diyar kir

... ragihand

... da zanîn

... agahî da / agahdar kirin

... der bir

... îdia kir (angaşt)

... destnîşan kir

... rêz kir

... bi bîr xist

... wiha berdewam kir /

.... wiha dom kir

... wiha pê de çû

... wiha dirêj kir

... bilêv kir

1.7.1.2. Lêkerên alîkar ên aktîf

... bersiv da / wiha bersiv da

... li ser sekinî / rawestiya

... rexne kir

... parast

.... nirxand

... şîrove kir

... sūcdar kir

... nerazîbûn (rastî nerazîbûnê hat / nerazîbûn nîşan da)

... hişyar kir

... nivîsand / ev tişt nivîsîn

... qal kir / behs kir

... giranî da

Bikaranîna vê rêbaza lêkerên nûçeyê yên li jor rêzkirî, di dema ku gotin rasterastji devê kesekî bê dayîn de tên bikaranîn. Ger gotin rasterast ji devê çavkaniya nûçeyê neyê dayîn, wê demê di şûna lêkerên aktîf de divê lêkerên nûçeyê yên pasîf bên bikaranîn.

1.7.2.1.Lêkerên pasîf

Di zimanê Kurdî de dema “hat”, “hatin” û “tê” bê ber lêkerê, lêker pasîf dibe.

... hat aşkerakirin

... hat ragihandin

... hat derbirîn

... hat diyarkirin

... hat îdiakirin

... hat pêşniyarkirin

... wiha hat gotin

... hat rêzkirin

.... agahî hatin dayîn

... hatin rexnekirin

... hat / hatin kirin

... hat / hatin bikaranîn

Bikaranîna vê rêbaza lêkerên nûçeyê yên li jor rêzkirî, di dema ku gotin rasterast ji devê kesekî neyê dayîn tên bikaranîn.

1.7.2.2.Di daxuyaniyên nivîskî de bikaranîna lêkerên pasîf

Di daxuyaniyên nivîskî de, lêkerên nûçeyê bi awayekî pasîf têne bikaranîn. Di vê awayê bikaranînê de li ber lêkera nûçeyê yan “**tê**” tê bicîkirin an jî piştî lêkera nûçeyê “**tên**” tê danîn. Ev awa hem ji bo nûçeyên daxuyaniyên nivîskî hem jî ji bo agahiyên ku ji kulîsan hatine wergirtin derbas dibe. Ji bo pêşketinên ku pêkane di pêşerojê de pêk bên jî derbasdar e.

- **Tê diyarkirin** ku hiqûqnasên AKP'î ji bo pêşîbirîna girtina partiya xwe pêşniyar kirine ku di Makeqanûnê de guherîn bê kirin.

- **Tê destnîşankirin** ku ji bo astengkirina girtina partiyên siyasî, dê AKP û MHP li ser formula guherîna Qanûna Partiyên Siyasî li hev bikin.

Ji lêkerên pasîf di şêwazê de mînak:

... tê aşkerakirin

... tê ragihandin

... tê derbirîn

... tê diyarkirin

... tê îdiakirin

... tê gotin

... wiha tê gotin: "....."

... wiha tê rêzkirin: "....."

BEŞA DUYEM

2.BIKARANÎNA ZIMAN JI ALIYÊ RASTNIVÎSÊ VE

2.1. Bikaranîna hejmaran di rastnivîsa nûçeyan de

Ne tenê di nûçeyên kurdî de, di nûçeyên piraniya zimanên cuda de awayeke nivîsînahejmaran heye. Ji bo ku xwîner bikaribin zû nûçeyê bixwînin û li hejmaran asê nebin, pêdivî bi hêsankirina nivîsîna hejmaran heye. Zimanê kurdî ji hemû zimanan zêdetir hewcedarê vê hêsankariyê ye.

- Hejmarên (0) sifir û (1) yek bi nivîsê tê nivîsîn.

- Hejmarên ji 2'an heta 999'an divê bi reqem bîn nivîsîn.

Mînak

Ji sedî 78, 2 derece, di sala 1889'an de, riya 75 metrî, di qezaya trînê de 3 kes mirin û 260 kes jî birîndar bûn û hwd.

- Hejmarên hezar û ji hezaran zêdetir bi nivîsên nivîsîn.

Mînak:

Budçeya îsal a şaredariyê 8 milyon û 389 hezar lîre ye.

2.2.Nivîsîna mêjûyê

Di nûçeyê de heke behsa dîroka sala em tê de ne tê kirin, hewce nake sal bê nivîsîn. Lê heke dîroka ku behsa wê tê kirin salên berê yan jî salên li pêş be divê ew sal bê nivîsîn.

- Di 22'ê nîsanê de

- Di 22'ê nîsana 1898'an de

2.3.Nivîsîna mehan

Di rojnamevaniya kurdî de aloziya herî zêde di bikaranîna mehan de ye. Heta niha jî mehên bi kurdî nehatine standardîzekirin û her rojnameyek an ajans, malper, radyo û kanalên televîzyonan li gorî polîtîkaya xwe ya weşanê navên mehan bi kar tînin. Li Herêma Federal a Kurdistanê navên mehan nayên bikaranîn û zêdetir di şûna mehan de hejmara wê mehê tê bikaranîn. Lê li welatê me jî tevliheviyeke mezin heye. Yê xelkê 12 meh lê mixabin ên kurdan ji ber vê tevliheviyê 36 mehên wan hene. Bo nimûne hin dezgehên ragihandinê "tebax" hin dezgehên ragihandinê jî "gelawêj" bi kar tînin. Her wiha hin dezgeh "Sibat" hin dezgeh "reşemî" bi kar tînin. Mehên weke rêbendan, sibat, nîsan, pûşper, tîrmeh, rezber, cotmeh û mijdar mehên herî zêde ku cuda tên bikaranîn. Ji bo standardkirina mehan biryareke hevpar pêwîst e û wisa dixuye ev yek jî dê demeke dirêj bigre.

Di nivîsîna mehan de jî hin dezgeh bi tîpên hûrdek û hin dezgehên ragihandinê jî bi tîpên hûrdek dinivîsin. Lê dema hejmar hebe bikaranîna tîpa girdek rastir e. Lewre bi tîpa girdek wateyeke girîng li wê mehê tê kirin. Jixwe di nûçeyê de dema navê mehekî tê bikaranîn ev tê wê wateyê ku ew rojeke girîng e.

Mînak:

22'ê Nîsanê Cejna Rojnamevaniya Kurdî ye.

Newroz di 21'ê Adarê de tê pîrozkirin.

2.4. Nivîsîna saetê

Di hin nûçeyan de divê saet û deqîqe bêne nivîsîn. Di nûçeyê de saet bi reqem tê nivîsîn. Di navbera saet û deqeyê de xalek (.) tê bikaranîn. **Mînak: Saet di 11.45'an de.**

Dema saet hate nivîsîn divê peyva saet "li dora" 11.45'an neyê bikaranîn. Jixwe saet û deqe hatiyenivîsîn, ji ber vê yekê hewcedarî bi peyva "li dora" an jî "li derdora" tune ye.

2.5. Nivîsîna kurtenavan

Di kurteyan de -hin sazî ne tê de- navên kinkirî bi temamî bi tîpên girdek tên nivîsîn.

Mînak

- YE (Yekitiya Ewrûpayê)

- NY (Neteweyên Yekbûyî)

- DYA (Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê)

-PDK (Partiya Demokrat a Kurdistanê)

- DMME (Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê)

2.6. Nivîsîna navên erdnîgariyan

Di kurmancî de hêdi navê erdnîgariyên ku ji hevokê zêdetirin de, lihevkirinek tune. Hin derdor tenê bi navê ku li cî hatiye kirin bi tîpa girdek dest pê dikin. Yanê Çemê Çetelê wekî “**çemê Çetelê**” dinivîsîn.

2.7. Nivîsîna navên netewe, ziman, ol û îdeolojiyan

Hin dezgehên ragihandinê navên netewe, ziman, ol û îdeolojiyan bi tîpên girdek û hin dezgehên ragihandinê jî bi tîpên hûrdek dinivîsîn. Di vir de jî standardî tune ye. Di serî de rojnameya Azadiya Welat, Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Enstîtuya Kurdî ya Amedê û hin derdorên din jî van navan bi tîpên hûrdek dinivîsîn. Ger em li ser vê şopê biçin, divê navê **netewe, ziman, ol, mezheb û îdeolojiyan** bi tîpên hûrdek dest pê bikin. Ji bo ku rojnamevanên ku li ser vê şopê diçin em ê çend mînak bidin.

Mînak:

- Kurd, tirk, faris, ermen, sûryanî, keldanî, çînî, frensî, yewnanî, îtalî, gurgî...
- Misilman, cihû, îsewî, êzidî...
- Elewî, sûnî, henîfî, şafîî, hembelî, ortodoks, protestan, katolîk...
- Marksîzm, liberalîzm, maoîzm, sosyalîzm, kapîtalîzm, emperyalîzm...

Her çi qas li ser bikaranîna tîpên hûrdek û girdek lihevkirinek tunebe jî ev derdorên ku di vê mijarê de bi hev nakin, navên kes, sazî û dezgehên taybet û navê cî û war û bajaran, bi tîpên

girdek dinivîsîn. Ev hêla wan a hevpar e. Ji hêlên wan ên hevpar çend mînak:

- Beşa Kurdolojiyê ya Zanîngeha Artukluya Mêrdînê
- Qada Şêx Seîd
- Dêra Surp Giragosê
- Mizgefta Mezin a Amedê

2.8. Rastnivîsa tîp û paşgiran

2.8. 1. Nivîsîna Tîpa I

Tîpa “**i**” dema ku girdek tê nivîsîn bê xal yanî wekî “**I**” tê nivîsîn.

Mînak:

IRAQ, DAGIRKER, KARIK, ŞEKIR, BERXBIR, XATIR, KAKIL, ŞAKIR...

2.8. 2. Nivîsîna paşgira "stan"

Di navê gelek welatan de paşgira “stan” heye. Beriya paşgira “stan” divê tîpa ‘i’ bê bikaranîn. Gelek caran dema ev paşgir tê nivîsîn beriya paşgirê tîpa “**i**” tê bikaranîn, ev yek xelet e. Hewce ye di şûna tîpa “**i**” de tîpa “**I**” bê bikaranîn. Mîrov ji bo fêmkirina vê mijarê dikare navê “goristan”, “daristan”wekî mînak nîşan bide. Di van peyvên de jî dixuye ku raseniya tîpê “**i**” ye.

Mînak:

Daxistan, Hindistan, Kirgizistan, Ermenistan, Turkistan, Kazakistan...

2.9. Nivîsînanavên cih û warên biyanî

Ger elîfbaya welatên ku navê wan di nûçeyê de derbas dibe bi elîfbaya ku em bi kar tînin re eynî be, navê wan welat û bajarên wan welatan zêdetir wekî reseniya xwe tê bikaranîn.

Mînak:

Washington, San Francisco, New York...

2.10.1. Nivîsîna dirûşm, pankart û dowîzan

Di nûçeyê dirûşm, pankart û dowîz di nava dunikê de têne bikaranîn. Lê ger di nûçeyê de ev hersê tişt jî wekî navbernav an jî sernav hatibin bikaranîn, wê demê divê di nava neynûkek de bèn nivîsîn.

Mînak:

"Zimanê me rûmeta me ye" (Pankarta ku di nava nûçeyê de hatiye bikaranîn)

"Bê ziman jiyana nabe" (Pankarta ku di nava nûçeyê de hatiye bikaranîn)

'Zimanê me rûmeta me ye' (Pankarta ku di sernav û navbernavê de hatiye bikaranîn)

'Bê ziman jiyana nabe' (Pankarta ku di sernav û navbernavê de hatiye bikaranîn)

2.11. Di rastnivîsa nûçeyan de nivîsîna daçekan

Di kurmancî de daçek bi tena serê xwe tennivîsîn. Her wiha daçekên hevedudanî jî ji hev cuda tennivîsîn.

Mînak:

Hogir duh **li** vir bû, îro **bi** ku **de** çû?

Zozan dema ku **ji** dibistanê dihat, **di** nava gundekî **re** derbas bû.

Di nivîsîna daçekan de bi tenê awarteyek heye; di hin bêjeyan de ji daçekên hevedudanî ku ji pêşdaçek û paşdaçekan pêk tînin, dema ku pêşdaçek bikeve, paşdaçek bi bêjeyê ve dizeliqe.

Mînak:

Dûre, piştire, lewre...

Cînavkên pêvebestî bi lêkeran ve tînenivîsîn, lê ji rengdêr, cînavk û navdêran cuda tîne nivîsîn.

Mînak:

Bi hev ve	Cuda
ez diçim	ez baş im
tu çûyî	ew mamoste bû
ew ê biçe	Hesen tu yî?

Di bêjeyên mîna “bikir”, “nexweş”, “neyar”, “nemir”, “bêbav”, “bêmirûz”, “bêteşe” de /bi/, /bê/ û /ne/ pêşgir in, lewre jî bi bêjeyê ve tîne nivîsîn.

Wekî din jî hin tişt hene ku divê cuda bêne nivîsîn. Gihanek, hevalkar, hokerên hevedudanî ji hev cuda tîne nivîsîn.

Mînak:

- Tu caran, tu demê, tu rojan, tu kes, tu tişt, tu mirov...
- Ev tişt, ev kes, ew kes, ew qas, ev çend, çi qeder, hin kes, gelek kes, yek kes, du kes...
- Hemû kes, hemû tişt...

2.11. Nivîsîna cînavka "çi qas" di rastnivîsa nûçeyê de

Di rastnivîsa cînavkan de bi tenê yek awarte heye, ew jî cînavka “**çi qas**” e. Li gorî rêziman

divê cuda bê nivîsîn, lê ew jî wekî hevalnava çawan bûye bêjeyek û lewre jî bi hev ve tê nivîsîn.⁵

2.12. Nivîsîna navdêrên nêr û mê

Ji ber ku li bakurê welat dibistanên Kurdî ava nebûne, perwerdehiya Kurdî tim qedexe bûye, zimanek standard hêjî pêk nehatiye. Di vê hêlê de pêşveçûnên girîng û hêja hebin jî dîsa her herêm bi devoka xwe diaxivî. Sedem tam nayê zanîn lê li gelek herêman hin zayend wekî mê, li hin herêman jî heman zayend wekî nêr tê bikaranîn. Ev yek gelek caran dibe sedema dubendî û tevliheviyan. Bo nimûna peyvên mîna **tişt, por, rih** û hwd li hin herêman wekî nêr û li hin herêman jî wekî nêr tên bilêvkirin. Di dema nivîsîna nûçeyê, pêvajoya edîtoriyal û redaksiyonê de jî ev pirsgirêk gelek caran dibe sedema serêşiyê. Ji ber vê yekê gelek caran hejmara zêde ya heyî çî bibêje ew navdêr wisan tê bikaranîn. Ev jî bi xwe re pirsgirêkeke diwartir tîne û xwendevan neçar dimînin ku zimên xelet hîn bibin.

2.12.1. Navdêrên nêr

1) Hemû hevenav û sernavên giyanewerên nêr.

Mînak:

Azad, bav, xal, bira, ap, pismam, xezûr, zava, Gurgîn...

2) Hejmara yek ne tê de hemû jimarnav.

Mînak:

Duyê şevê, çarê adarê, şeşê êvarî, sedê min...

3) Navên deman dema wekî navdêr bînan bikaranîn.

⁵Samî Tan, Rêziman û Rastnivîsa Zaravayê Kurmancî, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê 2005 r.324-326.

Mînak:

Zerê gûzan, sorê sêvan, keskê tarî, şînê behrê...

4) Hirî, liva, hêk, lorik, toraq ne tê de, hemû berên ku ji sewalan bi dest dikevin.

Mînak:

Goştê mirîşkan, çermê maran, dohnê goştî, dûvê mihan, mûyê bizinan, hingivê Dêrsimê, şîrê mihan, mastê me, dewê birûn, firoyê çêlekê, toyê mastî, rûnê nivîşk...

5) Cîwa ne tê de hemû navên metalan nêr in.

Mînak:

Zêr, zîv, hesin, sifir, pola...

6) Şemamok ne tê de hemû berên bîstên.

Mînak:

Zebeş, petêx, qitî, kundir...

2.12.2. Navdêrên mê

1) Hemû hevenav û serenavên giyanewerên mê.

Mînak:

Zîn, Zelal, xwîşk, xesû, dê, bûk, diş, dotmam...

2) Kon, xanî, axur ne tê de, hemû cî û wargeh mê ne.

Mînak:

Jûr, qonax, hêwan, kargeh, hewş, dêr, mizgeft, nivîsgeh, gom...

3) Makîneyên ragihandinê mê ne.

Mînak:

Erebe, balafir, firoke, kelek, keştî, kamyon, otobûs, duçerxe...

4) Ezman û ewr ne tê de hemû heyberên fezeyî û qewmînên atmosferî mê ne.

Mînak:

Heyv, stêrk, zîpik, xusî, pûk, babelîsk, bahoz...

5) Garis, genim, ceh tirî ne tê de hemû celebên baqleyan, fêkî û sewzeyan mê ne.

Mînak:

Hinar, sêv, bîhok, guhij, xox, mewîj, pîvaz, tivir, kartol, bacan, firingî...

6) Serenavên cografîk hemû mê ne.

Mînak:

Ewrûpa, Mêgahmed, Amed, Dêrsim, Rûsya...

7) Gund, bajar, welat, erd, çiya, zozan, çem, delav, gir, zinar, kendal ne tê de hemû navên cografîk mê ne.

Mînak:

Bîr, gol, tengav, kendav, newal, parzemîn, cihuk, kanî, hevraz, herêm, dever...

8) Amûrên muzîk û buroyê giş mê ne.

Mînak:

Def, dahol, bilûr, mase, kursî, daktîlo...⁶

⁶Samî Tan, Rêziman û Rastnivîsa Zaravayê Kurmancî, Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê

Encam

Di vê xebatê de hate dîtîn ku ji ber tunebûna dibistanên kurdî di zimanê nûçeyan de standardeke li gorî reseniya kurdî tune ye û gelek caran ji ber ku rojnamevan zimanê tirkî ji zimanê kurdî baştir dizanin, zimanê kurdî di ragihandinê de derbeyeke mezin dixwe. Her çiqas hemû peyv bi kurdî jî bin bilêvkerin û sazkirina hevokan ji ber ku bi mantiqa zimanê tirkî tê hunandin, ji kurdî zêdetir bîna tirkî ji sazkirina hevokan tê. Her wiha bi dehan lêkerên nûçeyê yên kurdî hene lê digel vê yekê jî lêgerên "Got", "Wiha got", "Axivî", "Wiha axivî", "Diyar kir", "Destnîşan kir" û "Anî zimên" têne bikaranîn. Di ragihandinê de hema hema lêkerên din ên nûçeyê "Bal kişand", "Vegot", "Bi lêv kir", "Da zanîn", "Pê de çû" qet nayên bikaranîn. Ev jî nîşan dide ku lêhûrbûneke zêde di rojnamevaniya kurdî de bi pêş neketiye û ev yek jî bikaranîna zimanê kurdî di hêla şêwaza pêşkêşkirin û nivîsîna nûçeyan de gelek qels dihêle. Di hêla rastnivîsê de jî bikaranîna navên mehan, navên sazî û dezgehên fermî, navên cih û waran, erdnîgariyan, navên netewe, ol û mehzeban jî belawela tên bikaranîn û standardbûneke bi rêk û pêk cih negirtiye. Her wiha bikaranîna hejmaran, rengdêr û deman jî gelek caran li gorî rastnivîsa kurdî nayên nivîsîn. Di zimanê nûçevaniyê de tevlihevkirina nêrtî û mêtiyê jî li gorî herêman li ber çavan dikeve û ev yek dibe sedem ku dezgehên ragihandinê di hêla ziman de bandoreke neyînî li ser nifşên nû yên civakê bike.

ÇAVKANÎ

APAYDIN, H. Yunus, "Kefalet", **Diyanet İslam Ansiklopedisi** TDV Yayınları c.25, Ankara 2002.

GİRGİN, Atilla, **Haber Yazma Teknikleri "Haberci Adayının El Kitabı"**. İnkılap Yayınları. İstanbul, 1998.

GİRGİN, Atilla, **Haber Yazmak**. Der Yayınları, Stenbol

GİRGİN, Atilla, **Yazılı Basında Haber ve Habercilik Etik'i**. İnkılap Yayınları. İstanbul, 2003.

BASIN, Yayın Konseyi, **Gazeteci, kimdir?** Basın Konseyi Yayınları. İstanbul, 1993

DEKAK, Maşallah, **Nûçe û Nûçevanî 3Ç û 3K**. Weşanên Lîsê. Amed, 2010

ASLANOĞLU, Osman, **Ferhenga Çapemeniya Kurdî**. Weşanên Nûbiharê. Stenbol, 2017

TOKGÖZ, Oya, **Temel Gazetecilik**. İmge Kitapevi Yayınları, 2003.

TAN, Sami, **Rêziman û Rastnivîsa Zaravayê Kurmancî**. Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê

TAN, Sami, DEKAK, Maşallah, **Pirtûka Destan a Nûçegihaniyê**. Ajansa Nûçeyan a Dîcleyê. Stenbol, 2006.

FARQÎNÎ, Zana, **Ferhenga Tirki-Kurdî**. Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê.

Çavkaniyên İnternetê

http://www.amidakurd.net/ku/tekst/kurmanc%C3%AE_%C3%BB_mantiqa_tirk%C3%AE

Amîdakurd, Hevpeyvîna Bahoz Baran ya 28.04.2016'an.

Zana Farqînî / 07.03.2008) Lînk: (<http://diyarname.com/news.php?Idx=157>)